hejmar 26 Payîz 1999

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Parîsê

Civîna 26emîn ya ***Kurmancî*** di navbera rojên 25-30/10 1999an de li Marly-le-Roi, nêzîkî Parîsê çêbû.

Beşdarên civînê li ser îdyomên kurdî, bergûz an şel û şepik li Bahdînan, devoka Qerejdaxê, xwarinên Serhedê, cureyên endamên laşê mirovan û îdyomên jê çêkirî, termên komputerê û li ser peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de xebitîn.

Di vê civînê de Husên Bênavî (Berwarîbala), Joyce Blau (Parîs), Michael Chayet (Waşington), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamişlo), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Kotol) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara ***Kurmancî*** de tên belav kirin.

Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de

I. DI ZIMANÊ TIRKÎ DE

Amadekar : Reşo ZÎLAN
Behroz ŞUCAÎ

Zimanê kurdî, di nav zimanên hindoewropî de, ji koma zimanên îranî ye. Mebest ji zimanên îranî, binavkirina hemû zimanên xwîşk û bira yên ku di nav vê komê de ne. Ev kom ji van zimanên ku îro têne axaftin, wek: farsî, kurdî, belûçî, derî, tacikî, osetî, tatî, talişî, peştûyî û hwd pêk têt. Gava ku mirov dibêje zimanê îranî, ev nayê wê maneyê ku mebest farsî ye. Li bervajiyê vê, hemû ew ziman in, ku îro tên peyvîn yan jî berê dihatin axaftin lê niha mirî ne. Ango navê wê komê jê tête qest kirin.

Di zimanê kurdî de peyv hene, ku bi tenê kurdî ne. Ango di nav gelên îranîziman de ew peyv bi tenê li ba kurdan hene. Wek peyvên ***kur, keç, zarok*** *(=zar, zaro, mindal)*, ***reş, rondik*** (=*hêsir, stêr, histêrk, firmêsk*). Lê hin peyv jî hene, ku tevî ku di zimanê kurdî de hene, di hemû zimanên din yên îranî de jî hene, ku yan her bi \`eynî rengî yan jî hinek caran piçekî cihê û bi aksaneke din têne bi lêv kirin. Wek ***dest, yek, bazar, gul, dûrbîn/ dûrebîn***.

Ji peyvên weha hevpişk re peyvên "*îranî*" têne gotin. Ji ber ku ew malên hemû gelên îranîziman in. Lê gava ku ji van gotinên îranî peyveke din li gor peyvsaziya kurdî hatibe afirandin, êdî ew peyveke kurdî ye. Wek dest gotineke îranî ye, lê heçî peyva destegul e, dibe kurdî. Ji ber ku di zimanên din yên îranî de peyveke bi vî rengî ku bi tenê peyveke hevedudanî be û di vê maneyê de bête bi kar anîn tune ye. Lê ew di şûna peyveke hevedudanî de, peyveke nehevedudanî ya bi îzafeyê çêkirî bi kar tînin. Herweha ev çend peyvên din in, ku li gor peyvsaziya kurdî ne :

serbijêr (bi tenê peyva ***ser*** bi îranî)
bejinûbala (bi tenê peyva ***bala*** bi îranî)
dilketî (bi tenê peyva ***dil*** bi îranî)
nankor (bi tenê peyva ***nan*** bi îranî)
berşîr (bi tenê peyva ***şîr*** bi îranî)

Peyv jî hene ku ji zimanekî din yên îranî hatine û ketine kurdî, bêî ku bilêvkirina wan bête guhartin yan jî bi guhartineke piçûk, îro jî têne bi kar anîn. Wek: ***Nimayiş***, ku navdêreke lêkerî ye û ji lêkera ***nimûden*** ya farsî têt. Di kurdî de berginda vê lêkerê ***nimandin*** e û her bi maneya ***nîşandan*** û ***pêşkirinê*** de ye. Lê heçî peyva ***nimayiş*** *e*, di çend maneyan de tête bi kar anîn. *1.* ***Xwepênîşandan****, **mîtîng*** *2.* ***Di kurdiya soranî de her bi maneya pê****şraxistin, pênîşandan, nî****şandanê***. Herweha ***newzad,*** ku ji peyvên ***now (new)*** û ***zad*** pêk hatiye. ***New/now*** ya farsî, bi kurdî ***nû*** û -***zad*** ya farsî, bi kurdî ***–za***, ango ***nûza***. Lê eger em ji dêl ***newzad*** ya farsî bi kurdî peyva *nûza* bi kar bînin, dê maneyeke din jê derkeve. Kurd *nûza* ji bo zarokên ku nû ji diya xwe bûne û çend rojî ne, dibêjin. Lê peyva ***Newzad*** di kurdî de ji bo navê kuran tête bi kar anîn û ne di vê maneya me gotî de. Heçî di farsî de ye, ev peyv ne wek nav lê belê bi tenê di maneya *nûza* de tête bi kar anîn. Herweha wek peyvên din. ***Namzed, name, nimûne, newroz / newrûz (nûroj)*** û hwd.

Vêca gava ku em dibêjin filan bêje îranî ye yan jî kurdî ye, mebest jê ew e, ku me li jorê şerh û ronahî kiriye.

Armanca vê kurtelêkolîna me ya han ne ew e, ku em dewlemendî yan jî jarî û qelsîya zimanekî cîran raxînin pêş çavan. Bi encama jê bidestketî bixwazin bibêjin, ku zimanê me di ser gişt zimanan re ye. Ji filan yan jî bêhvan zimanî dewlemendtir e, paqijtir û zelaltir e. Ne wek wî zimanî zimanekî têkilhev e û gencîneya peyvên wî ji çend bêjeyan bêtir nîne. Ev reng helwêst û awir ne rast in. Em xwe herdem jê gellekî dûr dixin. Lê dijmin û nehezên gelê me timî bi mêjî û têgihîştineke şovenî ya bi vî rengî li zimanê me nihêrîne. Xwastine ku kurdî bikin yan zimanekî tuneyî, yan zimanekî têkilhev û yan jî zaravayek ji zaravayên pir paşdemayî yê zimanê xwe.

Divê qenc bête zanîn, ku çu zimanek nîn e ku ne dewlemend be, her qels û jar be. Her zimanek li gor xwe, li gor dînamîkên xwe dewlemend e. Eger ji dînamîkên xwe îstifade bike, dikare di her warî de her tiştî pê bîne zimên, bibêje û binivîse. Bi alîkarîya wan dînamîkan dikare rêya afirandina peyvan li ber xwe xweş bike da ku bikaribe ji xwe re term û mefhûmên pêdivî biafirîne. Bi vî awayî dikare zimanê xwe bike zimanekî nûjen, geşedarbûyî û zimanê zanistê. Ji bilî vê rêyê, rêyeke din jî heye, ku ew jî ji zimanên din bideynkirina term û mefhûmên pêdivî ye. Ev jî hîç ne ji qelsî û jarîya wî zimanî ye, heye ku mecbûrîyetek be ji mecbûrîyetên cîhana îroyîn ya her ku diçe piçûktir dibe. Serdema niha, ku serdema teknolojîyê ye, tixûb nema xwe li ber radigirin. Ziman jî hew dikarin bi tenê bi peyv û bêjeyên xwemalî xwe têr bikin. Ji wan re sifreyeke ji peyvên dereke xemilandî jî pêwîst e, da ku bikaribin bi wê çavkanîyê zorê ji astengan bibin.

Çawan ku me ji zimanên cîran peyv biribin, wisan jî wan ji me birine. Bi lêkolîneke holê em dixwazin bandora zimanekî qedexekirî, ku yek ji mezintirînê tawanên li hember mirovatîyê ye, li ser zimanekî serdest nîşan bidin. Herweha bibêjin, ku divê xwedîyên 'eslî yên van peyvan çu caran bi tirsa ku ew ji zimanê "tirkî" ne, xwe ji bikaranîna wan nedin paş.

Heçî ji bo derxistina 'esl û bineçeyên van peyvan e, me wek çavkanî pirtûk û xebatên etîmolojîk yên zanistî bi kar anîne. Me pişta xwe çu caran nedaye etîmolojîya gelêrî ku bi her awayî ji zanistê dûr e. Herwisan me di vê lêkolînê de xwastîye ku em kurdîbûna bi tenê peyvên ku îro di zimanê nivîskî yê tirkî de gellekî têne bi kar anîn destnîşan bikin. Bi tenê li ser peyvên sade yan jî hevedudanî rawestin, ku hemû perçeyên wê kurdî-îranî ne û ne ku bes perçeyek jê bi kurdî-îranî lê yê din bi tirkî be.

Piştî ku me lêkolîna xwe ya li ser zimanê tirkî û zimanên din yên cîran jî kuta kir, em ê vêca dest bi berevajîyê wê bikin. Ango, peyvên ku ji zimanên cîran ketine kurdî.

Çend kurte :

far.	=	farsî
peh.	=	pehlewî
tr.	=	tirkî
lat.	=	latînî
îng.	=	înglîzî
skr.	=	sanskrîtî
part.	=	partî

A

kurdî	fransizî	ingilîzî
abanoz: abanûz, ***far:*** *abnûs,* ***lat:*** *ebenus*	ébène	ebony
abara, abrah: avrê, avro, ***far:*** *abrah,* ***tir:*** *su geçiti, kanal*	canal, aqueduc	canal, aqueduct
abbaz: avbaz, sportmenê avê, ***far****: abbaz,* ***tir:*** *su sporcusu*	sportif aquatique	aquatic sportsman, show-diver
abıru: avrû, ***far:*** *abirû*	1) grâce, beauté; 2) honte, modeste	1) grace, beauty; 2) shame, modesty
acur: 'ecûr, (***lat:*** *cucumis flexuosus*)	concombre russe	Russian cucumber
ada: ade, girav, ***far:*** *adek, adak*	île	island
afyon: efyon, afyon, ***far:*** *efyûn,* ***lat:*** *opium*	opium	opium
afyonkeş: efyonkêş, ***far:*** *efyûnkêş*	fumeur d'opium	opium addict
aferin: 'eferim, aferîn, ***far:*** *aferîn*	vive, bravo	bravo, well done!
afsûn: efsûn, ***far:*** *efsûn*	charme, enchantement	charm, enchantment
agâh: ageh, ***far:*** *agah/ageh,* ***peh:*** *akas*	informé, au courant	aware, informed, vigilant
ahenk: aheng, ***far:*** *aheng,* ***peh:*** *aheng*	harmonie	harmony
ahır: axur/axir, ***far:*** *axur,* ***peh:*** *axwer*	écurie	stable
ahüvah: ax û wax	lamentation	lament
Ajda: bi kurdî ji peyva ***aj*** (bi tirkî ango *filiz, fidan, fide* ku hemû jî zimanê yûnanî ne) û lêkera ***aj dan***ê: *filizlenmek.* Bi kurdî navê keçan e. (Tirkan jî ew her ji bo navê keçan danîne.)	jeune plante; prénom de fille	young shoot; a girl's name
al: ale, sorê vekirî (wek *sorê ale*), ***far:*** *al/ala*	vermillon, écarlate	vermillion, scarlet
alev: alav, ***far:*** *alav, alave, elav, eluv,* ***tr:*** *yalım, yalaz*	flamme	flame
alıç: alûçe, alûc, 'alûc, ***far:*** *alûçe,* ***lat:*** *crataegus*	prune verte et aigre	green, sour plum
ambar: 'embar, 'inbar, ***peh:*** *henbar/enbar,* ***far:*** *enbar*	dépôt, entrepôt	store, storehouse
amaç: armanc/amanc, ***far:*** *amac*	but, cible	target, aim

amade: amade (=hazir), ***far:*** *amade*	prêt, disponible	ready
aptes: avdest, ***far:*** *abdest*	ablution	ritual ablution
apteshane: avdestxane, destavxane	toilettes	toilets
arzu: arizû, ***far:*** *arizû,* ***peh****: arzok*	désir	desire
asayiş: asayîş, ***far:*** *asayiş,* ***peh:*** *asayişn*	ordre public	public order
astar: astar, ***far:*** *aster*	doublure	lining
aş: aş (xwarin, xurek), ***far****: aş,* ***peh:*** *aş,* ***skr:*** *âçe,* ***lat:*** *esus*	plat cuisiné	cooked dish
aşhane: aşxane, lokanta	1) restaurant; 2) cuisine	1) restaurant; 2) kitchen
aşikâr: eşkere/aşkira, ***far:*** *aşikar,* ***peh:*** *aşkarek*	évident, manifeste	obvious, manifest
aval: awal, ‘ewal, ‘ewêl	crétin, simplet	fool, simpleton, idiot
avadan: avadan (avakirî), ***far:*** *abadan*	ensemble d'outils	set of tools
avare: ‘eware, ***far:*** *avare*	oisif, désoeuvré	idle, out of work
avaz: awaz, ***far:*** *avaz,* ***peh:*** *avaz*	cri, clameur	cry, clamor
avize: awîze, ***far****: prs rad. avîz*	chandelier	chandelier
ayin: ayîn, ***far:*** *ayîn,* ***peh:*** *advên*	cérémonie religieuse, rituel	religious service, ceremony, rite
azar: azar, ***far:*** *azar,* ***peh:*** *azar*	souffrance, douleur	suffering, pain
azdırmak: azirandin, ***far:*** *azurden*	exciter, provoquer, exacerber	to excite, to provoke, to exacerbate

B

baba: bav, bab, ***far:*** *baba*	père	father
baca: pace, ***far:*** *baceh*	conduit de fumée, cheminée	chimney
baç: bac, ***far:*** *bac,* ***peh:*** *vaj*	tribut, taxe, péage	tribute, taxe, toll
badem: behîv, ***far:*** *badem*	amende	almond
bağ: bax, ***far:*** *baẍ,* ***peh:*** *baẍ,*	vignoble, verger	vineyard, orchard
bağçe: baxçe, bexçe, ***far:*** *baxçe*	jardin	garden
bağışlamak: baxişandin, bexişandin, ***far:*** *bexşîden*	pardonner	to forgive
bahane: behane, ***far:*** *behane,* ***peh:*** *vehanek, behanek*	prétexte	pretext, excuse
bahar: bihar, ***far:*** *behar,* ***peh:*** *vehar*	printemps	spring
bahçıvan: baxçevan, ***far:*** *baxçeban*	jardinier	gardener
bahşiş: bexşîş, ***far:*** *bexşiş*	pourboire	tip, baksheesh
baht: bext, ***far:*** *bext,* ***peh:*** *bext*	fortune, chance	fortune, chance, luck
bahtiyar: bextiyar, ***far:*** *bextiyar*	fortuné, heureux	fortunate, happy
balaban: balaban, ***far:*** *balaban*	personne robuste	husky, robust person
barut: barûd, ***far:*** *barût*	poudre	gunpowder
batman: batman, ritil, ***far:*** *patmen/ batman*	mesure de poids	a unit of weight
bazubent: bazbend, pazûbend, ***far:*** *bazûbend*	brassard, talisman porté au bras	armband
bebek: bebek, bebe, ***far:*** *bebek*	bébé	baby
bedbaht: bedbext, ***far:*** *bedbext,* ***peh:*** *vetbext*	malheureux, infortuné	unlucky, unfortunate
bedbin: bedbîn, ***far:*** *bedbîn*	pessimiste	pessimist
bent: bend, ***far:*** *bend,* ***peh:*** *bend*	1) attache, cordon; 2) barrière, barrage	1) link, bond, tie; 2) barrier, dam
belge: belge (ji belg/pelg), ***far:*** *berge*	document	document
ben: ben, şanik, şan, şahnik, xal, ***far****: ben*	grain de beauté	beauty spot
berhudar: berxudar, ***far:*** *berxurdar*	heureux, prospère	happy, prosperous, successful
beste: beste, ***far:*** *beste*	composition vocale	vocal composition
bestekâr: bestekar	compositeur	composer
bet: bed, ***far:*** *bed,* ***peh:*** *vet*	mauvais	bad
beg **bey:** beg, ***far:*** *bêk, beg,* ***part:*** *bex¨ (xwedê),* ***peh:*** *beg*	seigneur, monsieur	lord,sir; title put after the names of servants and petty officials
beyaban: biyaban, ***far:*** *biyaban,* ***peh:*** *viyapan*	désert	desert, wilderness
beygir: bargîr, bergîr	cheval de trait	packhorse
bezirgân: bazirgan, ***far:*** *bazergan*	marchand	merchant
bezim: bezm, ***far:*** *bezm*	assemblée conviviale, banquet, fête	banquet, convivial meeting
bibi: bîbî(met), ***far:*** *bîbî û bi maneya dapîr e*	tante paternelle	paternal aunt
biz: bîz, bîze, dirêş	alène	awl
biçare: bêçare, ***far:*** *bîçare*	sans espoir, sans remède	without hope, without remedy
bigünah: bêguneh, ***far:*** *bîgunah*	sans péché, innocent	guiltless, innocent
bikes: bêkes, ***far:*** *bîkes*	seul, sans ami	lonely, friendless
birader: birader, ***far:*** *berader*	1) frère; 2) ami	1) brother; 2) friend
bizar: bêzar, ***far:*** *bîzar*	exténué	weary, exhausted
boran: boran (*berf û boran*), ***far:*** boran	tempête de neige	snow storm
borani: boranî, ***far:*** *boranî*	purée de potiron	pumpkin purée
bostan: bostan/bîstan, ***far:*** *bûstan,* ***peh:*** *bostan*	potager	vegetable garden
boza*:* *boze,* ***far:*** *boze*	boisson faite de millet fermenté	fermented millet beverage
bülbül: bilbil, ***far:*** *bulbul*	rossignol	nightingale

C

cağ: cax	1) roue à rayon (d'une bicyclette); 2) balustrade; 3) gros sac en cotonnade	1) wheel with spokes; 2) parapet; 3) sack of heavy cotton
cam: cam, ***far:*** *cam*	verre	glass
cambaz: canbaz, ***far:*** *canbaz*	acrobate	acrobat, rope dancer
camekân: camekan, ***far:*** *camiken*	vitrine	shop window, anything built with glass panes
camuş: gamêş, ***far:*** *gavmîş,* ***peh:*** *gawmêş*	buffle	water buffalo
can: can, gîyan, ***far:*** *can,* ***ave****: yane*	âme, coeur	soul, heart
canan: canan, ***far:*** canicanan	aimée	beloved
canavar: cinawir, ***far:*** *canever*	monstre	wild animal, monster
cengâver: cengawer, ***far:*** *cengaver*	guerrier, héroïque	hero, warrior
cenk: ceng, ***far:*** *ceng*	guerre	war
cevher: gewher (cewher), ***far:*** *coher,* ***peh:*** *gohr*	essence, joyau	jewel, essence
cicim: carcim/cacim, ***far:*** *cacîm*	tapis tissé à la main avec des dessins brodés	rug woven on a hand loom with embroidered design
ciğer: ceger/cîger/cerg, ***far:*** *ciger*	foie	liver
cihan: cîhan, ***far:*** *cehan,* ***peh:*** *gêhan*	monde	world
civciv/cücük: cûcik, cîvcîvk, çîçik, çivîk, ***far:*** *cûce*	poussin	chick
cıva: cîwe, ***far:*** *cîwe*	mercure	quick silver, mercury
civan: ciwan, ***far:*** *cevan,* ***peh:*** *cuvan*	jeune	young
coşmak: ji coş, ***far:*** *cûş ji cûşîdan*	s'enthousiamer, s'emporter, exulter	be ramied away, be enthusiastic, to exult
cömert: comerd/camêr	généreux	generous
cüda: cuda, cida, ***far:*** *cuda*	éloigné, séparé	separated, remote
curk/gurk: kurk, ***far:*** *kurk, kurç*		
cüce: cûce, ‘ecuc, ***far:*** *cûce*	nain	dwarf
cura: curre,hacûc, ***far:*** *curre*	petite variété de bağlama (luth oriental)	the smallest variety of bağlama (oriental lute)
cümbüş: cunbuş, ***far:*** *cunbiş, ji cunbîden: livîn, bizvîn, bizav kirin*	1) mouvement, agitation; 2) sorte de mandoline avec une caisse en métal	1) motion, movement; 2) kind of mandoline with metal body

Dûmahîk heye

Çend modelên bergûz anjî şel û şepika

Amadekar : Rojan HAZIM

Bergûz navê desteyê şel û şepikan e. Desteyekî bergûza ji şel, şepik, şal an jî şûtik, kerik, lewendî û şaşikê (şaşik ji dersokek an jî du dersoka çêdibe) pêk têt. Belêm xelk bo bergûza, şel û şepik jî dibêjin. Şel û şepik cil û bergên qedîm yên xelkê me ne. Perokê şel û şepika bi timamî ji merez, kej an jî hirîya paqij tête çêkirin. Belêm perokê şel û şepikên baş û saxlem bi gelekî ve ji merezî tête çêkirin ku merez muyê bizinên çur e. Perokê şel û şepika mixabin ku niha kêm tête kirin. Ji ber ku hem wekî berê pez xwudankirin kêm bûye, hem jî çêkirina vî perokî gelek biha disekine û ji ber hindê jî, kirîn jî biha dibe. Lewma ev peroke êdî kêm têne dîtin û şel û şepik jî kêm têne dirûn. Evro di cografyayeke gelek teng da ev cilike têne ber kirin. Li navenda Kurdistanê; Hekarî, Botan, Behdîna û li başûr jî, kêmek li navçeyên Soranan têne dîtin.

Ji vî perokî bi newilên cuda şel û şepik têne dirûn. Em dê li jêr çend modelên şel û şepika pêşkêşî we bikin.

1. Şemdînanî :

Deste ji şel, şepik, kerik, şal anjî şûtik û dersokê pêk têt.

Şel : Deling nîv fireh in. Navran gurc û kurt e. Navtang jî ne dirêj e. Berûk bê tûrik in. Tinê devê berûka vekirîye. Helbet şel bi doxîn e.

Şepik : Mil teng û dirêj in û derhiçikên wan hem bê ber in, hem jî têne badan û bê lewendî ne. Herweha binçengên wan jî şeq (anku vekirîne, ne dirûne) û gurc in.

Şal anjî şûtik : Şal ji rîs tête raçandin. Şûtik ji perokê pembû anjî sentetîkî tête çêkirin.

Kerik : Ji livayê tête çêkirin.

Di modelê Şemdînanîyan da hindek hêlên Şemdîna hene ku di ser bergûzan da kerikî jî dikin ber xwe. Di ber kirina vî modelî da navtang û maldoxîna şelî dikeve bin şal an jî şûtikê û qurmiçikên şelî li navtangê têne belav kirin.

Ev model bergûze, helbet di serî da li Şemdîna û dorberî da û heta Gever, Tirgever, Mirgever, Dize û heta dorberên Sîdeka jî têne ber kirin.

Di vî modelî da heke kes bixwaze dikare, pistû, bersing û derhiçikên şepikî û herweha devê berûka, derdeling û dormandorê maldoxîna şelî jî bide nexş kirin.

2. Ertoşîyanî-Zaxoyanî :

Deste ji şel, şepik, kerik, du dersok û lewendîya pêk têt.

Şel : Deling ji navtangê fireh in û ber bi derdelinga ve teng dibin û navran fireh û nîv şor e. Navtang jî li ser nêhkan e, anku maldoxîn bi timamî nakeve bin şalê. Her li bin zîya şalê an jî şûtikê tête girêdan û qûrmiçikên şelî li ber û piştên navtangê têne kom kirin. Şel bi doxîn e. Ev bergûze jî bi berûk in, belêm berûkên wan bê tûrik in. Tinê devê berûka vekirîye.

Şepik : Mil fireh û dirêjtirin û derhiçikên wan jî bê ber in. Binçeng jî dîsa şeq in û şortir in. Bi lewendî ne.

Lewendî an li ser derhiçika têne pêçan an jî li paş enîşka têne girêdan.

Lewendî : Desteyê lewendîya cot in. Ji perokê cang anjî xizneyî têne dirûn.

Şal anjî şûtik: Şal ji rîs tête raçandin. Şûtik bi gelekî ve ji perokên pembû an jî sentetîkî tête çêkirin.

Kerik : Ji livaya herî bi kalîte tête çêkirin. Di vî modelî da bi gelekî ve kerik tête ber kirin.

Şaşik : Ji du dersoka tête çêkirin. Carina di bin şaşikê da kumekî ji dezîyê pembû hatîye vehunîn jî dikin serê xwe.

Yên ku dixwazin, pistû, bersing û derhiçikên şepikî û herweha devê berûka, derdeling û dormandorê maldoxîna şelî jî didin nexş kirin.

(Li navçeyên Hekarî û Behdîna şel û şepikên bi modelê Ertoşîyanî-Zaxoyanî têne ker kirin û dirûn; heke pistû, bersing û derhiçikên şepikî û herweha devê berûk û derdelinga û dormandorê maldoxîna şelî hate nexş kirin, bo wan "Bekir Begî" tête gotin.)

3. Şirnexyanî-Botî :

Desteyê bergûza ji şel, şepik, êlek, şal anjî şûtik û şaşikê pêk têt.

Şel : Deling heta binî wekî borîyê fireh in. Navran nîv gurc e. Derdeling bi nexş in. Berûk bê tûrik in û devberûk jî bi nexş in. Navtang dirêjtir e û maldoxîn dikeve bin şal an jî şûtikê û qurmiçik li navtangê hem têne belav kirin, hem jî li ber û piştê têne kom kirin. Wekî hemû bergûza şel bi doxîn e.

Şepik : Wekî hemû modelên bergûza bê pistû ne. Hiçik ji milî ve piçek teng in, belêm derhiçik bi bertir in û têne badan. Stu, bersing û derhiçik bi nexş in.

Êlek : Berê êlekî ji perokê bergûzan e, lê pişt ji betenê pembû an jî sentetîkî ye. Pişt bi kemer e. Li bersingê herdu alîya çar berûk hene. Li ber derê berûka milê çepê qulpika zincîra seeta berûkê jî heye. Pistû û bersing jî bi nexş in.

Ev modele hem bi şaşik û lewendî, hem jî bê şaşik û lewendî tête ber kirin.

Şal an jî şûtik : Şal ji rîs hatîye raçandin. Şûtik ji perokê pembû an jî sentetîkî ye.

Di vî modelî da jî yên ku dixwazin, pistû, bersing û derhiçikên şepikî û herweha devê berûka, derdeling û dormandorê maldoxîna şelî jî didin nexş kirin.

4. Koçerî :

Deste ji şel, şepik, êlek, lewendî, şal anjî şûtik û şaşikê pêk têt.

Şel : Deling nîv fireh, derdeling jî nîv teng in. Navran jî nîv şor e û navtang bilind e û maldoxîn dikeve bin şal an jî şûtikê. Şel wekî hemû bergûza bi doxîn û bi berûk e û berûk jî bi tûrik in.

Şepik : Mil nîv fireh, derhiçik jî bi ber in û bi lewendî ne. Lewendî bi gelekî ve li paş enîşkê têne girêdan.

Êlek : Wekî êlekê modelê Şirnexyanî-Botî ye.

5. Rêncberî :

Perokê vî modelî bi piranî ji merez an jî hirîya kalîteya duyê tête kirin. Wekî nav jî li ser bi gelekî ve xelkê ku palehî û rêncberîyê dikin, berdikin. Ker kirina vî modelî bi piranî nêzîkî modelên Koçerî û Zaxoyanî ne, ku pê rabûn û rûniştin sanahîtir e. Ev modele jî ji şel, şepik, şal an jî şûtik, lewendî û dersokê pêk têt.

6. Sineyî-Bokanî :

Ev modele li nav Kurdên Soran tête ber kirin. Perokê vî modelî malik malik e. Wekî tête dirûn, malik serwar in anku merîdyenî ne.

Şepik : Hiçik fireh û dirêj, derhiçik jî fireh û bi ber in û têne badan. Binçeng şeq û şor in. Ev modele bê lewendî têtе ber kirin.

Şel : Navtang dirêj û fireh e û navran jî şor e. Deling li jor fireh û ber bi derdelinga ve teng dibin. Şel bi doxîn e.

Navtang û maldoxîn bi timamî dikeve binê şûtikê. Berûk hem bi tûrik, hem jî bê tûrik dibin. Li ser vî modelî bi gelekî ve şûtika ji perokê pembû an jî sentetîkî tête girêdan. Herweha ev model bergûze, bê kerik an jî bi kerik jî tête ber kirin. Kerikên vî modelî li hindek navçeyên Soranan bi sermilk in.

Nîvekarîyeke hemû perokên bergûza ew e ku, kirina perok û ker kirina bergûza, digel xelkê me yê navçeyê, lê bi gelekî ve bi destê fileyên navçeyê têtе kirin. Bi taybetî jî li alîyê Hekarî û Bahdîna kirina perokên bergûza û ker kirin, ji alîyê fileyên Tiyarê ve dihate kirin. Hindî yên Bota bûn, ew jî ji destê fileyên Herbolê derdiket.

Belêm mixabin ku, evro kêmbûna hejmara fileyên navçeyê û guhurînên dî yên demografik ev huner û kare jî kêm kirîye, lewma peyda kirin û ber kirina vî libasî hem bi zehmet ketîye, hem jî gelek biha bûye.

Yêk nîvekarîyeke dî ya hemû bergûza jî, bê şal an jî şûtik nayên ber kirin. Herweha ji ber ku perokê bergûza gelekî zivir e, di hemû modelên bergûza da, li bin şelî an derpêyê dirêj an jî pîjema têtе ber kirin.

Ferhengok :

bergûz; *desteyê şel û şepika,* ***taxima şel û şepika*** *:* şel ve şepik takımı
dersok; *axabanî, cemedanî, kefî :* kefye
şaşik: sarık
kerik; *êlek an jî cepkenê ji livayê hatîye çêkirin :* yün cepken
perok: kumaş, tekstil
kirina perokî: kumaş dokuması
kerkirina perokî: kumaş biçimi
file; *fele, Îsewî, Xiristiyan :* Hrıstiyan
gurc: çekik, çekilmiş
şor: sarkık, sarkmış
sanahî: kolay
hiçik: kol
derhiçik: kol ağzı
deling: paça
derdeling: paça ağzı
pistû: yaka
doxîn: yünden yuvarlak şekilde örülmüş ve kemer görevi gören kalınca ip
maldoxîn: kemer olarak kullanılan doxînin geçirildiği köprü
şal: yünden dokunmuş bel kuşağı
şûtik: pamuk veya sentetik kumaştan bel kuşağı
qurmiçik: pile
lewendî: dirseğe takılan ve kolağzından sarkan uzunca bez (giysinin önemli aksesuarıdır)
serwar: dikey, boylam, meridyen
cang: amerikan bezi
xizne: patıska
sermilk: omuzluk

Hinek ji xwarinên Serhedê

Amadekar : ELÎŞÊR

GIRARA DEWÎ, DEWÎN, MEHÎR :
Melzeme: Dan, pincar (kereng, mendê, pung, guhbizing, spanax...), dew û xwê.
Dan tê kelandin û pişt re dew dikin ser. Lê ji bo ku dewîn nebizire, berî ku dew têkin ser, hêk û ar (ard) dikin nav. Bêyî sekin heta ku bikele tê tev dan. Piştî ku keliya pincar dikin nav.
Hinek cûreyên din ên girarê jî hene û awayê çêkirina wan wekî yê jorê ye, lê li gor melzemeyê dikin nav tê bi nav kirin. Wekî girara (mehîra) bi nok, girara sar, girara germ, girara qiç (girara bêpincar).

ŞORBE :
Şorbe, piranî li gor ew melzemeyê tê de tê bi kar anîn tê bi nav kirin. Wekî mişewşî (şorbeya nîskan), şorbeya hurkên danî, şorbeya çirêşê, şorbeya mastî, şorbeya birincê, şorbeya terbiyekirî (goştê hêrayî, mîqtarek zêde bîbera reş dikin nav qîymê û hinek jî birinc bi kîmyonê dikin nav û paşê kifte çêdikin. Dikin nav avê û pişt re hinek ar bi zerka hêkê re di nav avê de baş tê çeliqandin û dikin nav kifteyan heta ku baş tîr dibe. Pişt re hinek nivişk tê qijilanrdin û hinek bîbera sor dikin nav û dibe şorbeya terbîyekirî. Birinca di nav goştê hêrayî de gerek e gelek kêm be).

GIRARA SIBÊ :
Melzeme: Dan, goşt, rûn.
Dan û goşt dikin dîzekê û dikin tendûrê. Ew heta sibê di tendûrê de dimîne û serê sibê derdixin û dixwin.

AVŞOR, şorav, avşork :
Melzeme: Hestiyên ji biryanê mayî, goştê sor, bacanê reş, domatês, fasûlye û ava ji biryanê palayî.
Ev serê sibehan tê xwarin.

AVŞORA KEŞKAN :
Melzeme: goştê bi hestî, kartolên biçûk ên spînekirî, avîdewê keşkên pişaftî, rûn, pîvaz.
Goştê bi hestî tê pehtin û pişt re kartolan dikin nav û ew jî dipije. Paşê avîdewê keşkên pişaftî dikin nav û dawiyê jî pîvazên di rûn de hatî sor kirn, dikin ser.

SAVAR :
Li aliyê serhedan, çend cûre savar hene. Taybetmendiya savar an birinca li van ciyan ew e ku, piştî savar an birinc tê pehtin rûn diqijilînin û berdidin ser vê birinc an savarê.
Savar, bi gelemperî li gor melzemeyê dikin nav tê bi nav kirin. Wekî savara nîskan (nîskên lib), savara serbizêr, savara sîngmirîşk, savara birişte yan bişehriye, savara baqleyan, savara kerengan, savara caxê, savara gulikê, savara helizan û hwd. Ji bilî van li aliyê Agiriyê savara sade jî tê çêkirin. Ev savara han piştî pehtina wê temam dibe, dov (dûv) perçe perçe dikin û datînin ser.

BIRINCA MIQEŞER :
Miqeşer: Nok tê xaşandin û qalikê wê li ser tê rakirin. Pişt re bi kirdanekê (merdane) tê perçiqandin heta baş hûr dibe. Paşê jî wê hiş dikin û hiltînin. Berî ku birinc bê çêkirin hinekî dikelînin û dikin nav birincê.

ÎÇPÎLAV :
Eger perçe goşt an mirîşk bi biharatê re bikin nav birincê, jê re îçpîlav tê gotin.

PERDEPÎLAV :
Eger îçpilavê bikin nav hevîrê ku bi rûn û şîr hatibe sitiran, dibe berdepilav. Li hinek ciyan kişmişê jî dikin nav.
Hevîr baş tê vekirin û wê îçpilavê dikin nav û devê wê baş asê dikin. Pişt re dikin nav quşxaneyekê û dipêjin.

DOLMÊN BIQATIX (QATIXLÎ DOLME) :
Melzeme: Savara hûr, goştê sor ê hêrayî, sîrmast, rûn û bîbera bi hev re sorkirî.
Savara hûr û goştê sor ê hêrayî dikin nav hev û baş miz didin. Bi vê libên wekî dolmên pel û keleman tên çêkirin û paşê tên pehtin. Piştî ku ew pijiya derdixin û sîrmast û ew rûn û bîbera bi hev re hatî sor kirin, dikin ser.

KILORÎK (TIRŞMANÇ AŞI) (xilorik, kiftê/kutilkê heşandî) :
Melzeme: Savara nîv hûr, goştê hêrayî.
Savara nîv hûr û goştê hêrayî dikin nav hev û baş miz didin. Pişt re ji vê xilorîkên gilover û biçûk tên çêkirin û dikin nav avê û dipêjin. Ji bo ku bi tam be, biharat û tirşa hinar û alûçeyan jî dikin nav. Ev xwarineke avî e.

ÎÇLÎ KUFTE :
Melzeme: Savara hûr, bezê ser paresû yan gurçikan, goştê hêtan ê baş hatî hêrayî, bîbera reş, pûlbîber.
Savar, goştê hêrayî û biharat bi hev re baş tên li hev dan. Pişt re çiqas ji destê mirov bê ew gilover û tenik tê vekirin û bez dikin navê û devê wê didin hev. Pişt re di nav avê de tên kelandin. Piştî ku çend kel bi ser de bên, derdixin û dixwin. Piranî bi mehîra karî (karî aşi) re tê xwarin. Ev cûre kufteyên han tenê li Bedlîsê tên çêkirin.
Li gundan perçe goştên biçûk an goştê hêrayî jî dikin nav wî bezî û libên kufteyan jî, li gor yên li bajêr, mezintir in.

TURŞÎ DOLME :
Melzeme: Goştê sor ê hêrayî, savara hûr, kelem, hebirman (hinarê hişkkirî), miqeşer an nîskê reş.
Goştê hêrayî, savar, hebirman û miqeşer an nîskê reş dikin nav hev û baş li hev dixin. Pişt re kelem tê xaşandin û perçên qasî destekî jê tên vekirin û ew savara hatî hazir kirin, dikin navê û devê wê didin hev û dipêjin.

KIFTEQUL, (kifteyên derewdanî) :
Melzeme: Hûrkê savar û mixelet (ew kelemê ku payîzê hûr hûr perçe dikin û dikin kûpan û ji bo zivistanê hildidin) , hinek ar, nivişk.
Mixelet bi kelemê wê re tê kelandin û berdidin ser savarê, piştî ku savar germijî tê mizdan û di vê navê de hinek ar didin ber û pişt re jî ji vê kifte çêdikin. Di dawiyê de careke din mixeletê dikelînin û kiftan dikin nav û bi rûnekî zêde ve tê xwarin.

GEBOL :
Melzeme: Savara gilgilê, keşk û rûnê qijilandî.
Piştî savara gilgilê hat çêkirin, dewê ji keşkên pişaftî dikin ser û dawiyê jî ew rûnê qijilandi berdidin ser.

PIÇUC :
Melzeme: Savara herî hûr (simîtk), pîvaz û rûn.
Ev melzeme hemî bi hev re tên kelandin. Gerek e ne rohn be û ne jî tîr bimîne.

ŞILLE, şile :
Melzeme: Savar, domatês, hinek pîvaz.
Savar tê pehtin û pişt re domatês û pîvaz jî sor dikin û dikin nav wê savarê. Ev jî wekî piçucê gerek e ne rohn be ne jî tîr be.

BIRYAN, parêv :
Laşê pez ê sax di êvarê de tê terbîye kirin (tenê bi xwê). Serê sibê bi çengelan ve dikin û dikin tendûra ku di erdê de bi taybetî hatiye çêkirin û heta baş sor dibe û pişt re derdixin. Perçe perçe jê dikin û bi kemalê afiyet dixwin.

PAPAZ YEXNÎ :
Melzeme: Perçên goştî, pîvazê wekî kixsan û salçe.
Van melzemeyan hemî dikin nav hev û dipêjin û dibe papaz yexnî.

PARESÜ, kalek :
Melzeme: Birinc, paresû û biharat.
Birinca bi biharatan çêkirî dikin nav paresûyan û diavêjin firinê û dipêjin.

HES DOLMESÎ :
Melzeme: Birinc an savar, kelem an pelên silk û mêwan û hwd, goştê hêrayî yê bi rûn, bîbera tûj û salçe.
Birinc an savar bi wî goştê hêrayî re tê mizdan. Pişt re ew belgên silk an mêwan qasî destekî tê jê kirin û ew melzemeyê mizdayî dikin nav û dipêjin. Piştî hat pehtin bîbera tûj û salçe dikin ser û dixwin.

KURT DOLMESÎ :
Melzeme: Kelem, gilgil, keşk.
Gilgil baş tê mizdan û pişt re dikin nav pelên keleman ên qasî destekî vekirî û dipêçin û pişt re jî dipêjin. Piştî ku hat pehtin, avîdewê keşkên pişaftî dikin ser û dixwin.

ÇORTÎ TEPLEMESÎ :
Melzeme: Tirşiya keleman, savara (şiş) ji genimê spî (kirik) hatî çêkirin, sîr, rûnê sorkirî.
Savar baş tê mizdan û pişt re ji vê libên pehnaya wan qasî pehnaya sê tiliyan tepleme tê çêkirin. Pişt re jî tirşiya keleman dikin nav dipêjin. Piştî hat pehtin rûnê sorkirî dikin ser û dixwin.

ÇORTÎ AŞI :
Melzeme: Dan, nîsk, goştê paresûyan.
Ev melzemeyên han hemî bi hev re tên kelandin. Xwarineke avî e.

KIFTÊ ÇORTIYAN (Çortî Koftesî) :
Melzeme: Hemî melzemeyên çortî teplemesiyê tên bi kar anîn. Ji bilî wan goştê hêrayî tê sor kirin û biharat dikin nav. Pişt re di ava çortiyê de tê pehtin û dawiyê de ew av jê tê palandin. Pişt re jî pelên çortiyê bi kifteyan re dikin tepsiyê û rûnê sorkirî dikin ser.

KIFTÊ SÎR :
Melzeme: Savara nîvhûr, hêk, hinek ar, hinek çantirî û xwê.
Ev melzemên han hemî bi hev re di nav ava germ de tên nerm kirin. Nêzîkî saetekê bi vî awayî dimîne. Piştî ku nerm bû, ji vê melzemê kifteyên piçûk ên gilover tê çêkirin û di nav avê de tê xaşandin.

HELÎSE :
Melzeme: Dan (eger danê kirikê hebe baştir e, lê eger ew tune be mirov dikare danê genimekî bêsimbêl bi kar bîne), goşt, nivîşk, xwê û av.
Dan û goşt di deneke ax de û di tendûreke erdê çêkirî de tê kelandin. Bi kêmasî du kes li ber rûdinin û bi darekî taybetî hatî çêkirin li hev didin. Ev lihevdana han heta ku goşt bi hestiyên xwe ve di nav dên de bihele dewam dike. Pişt re dikin tepsiyan û orta wê hinek vedikin û nivîşk dikin nîvê.

KELEDOŞ :
Melzeme: Nîskê hêşîn ê nehêrayî, qelî yan goşt, nanê loş, avîdewê keşkanû kakilê gûzan ê hêrayî, salçe û xwê. Li hinek navçeyan pincarên wekî heliz, cax û sipîtakê melzemeyên serekî yên keledoşê ne. Li hinek navçeyan goşt û pincar bi hev re tên bi kar anîn, li hinek ciyan jî tenê goşt an jî pincar dikin nav.
Nisk tê pehtin. Qelî an goşt di nav rûn de bi pîvazan re tê sor kirin. Piştî ku merheleya pehtin û sorkirinê xelas bû, qatek nanê loş qatek nîsk û qatek din jî qelî an goşt û kakilên gûzan ên hêrayî li ser hev tên danîn. Mirov dikare li gora kesên heyî van qatên han zêde bike. Di dawiyê de avîdewê keşkandikin ser û pişt re jî hinek salçeya di nav rûn de hatî qijilandin, berdidin ser.
Ev awayî jorê li aliyê Wanê û hinek ciyên din tê çêkirin. Li aliyê Bedlîsê û Agiriyê û dora wan, qatek pincara wekî sipîtakê, helizê û yan pincareke din jî tê danîn, lê melzemeyên din eynî ne. Li aliyê Bedlîsê gelek ciyan goşt nakin nav û tenê pincar tê bi kar anîn.

TUTMANC, PIŞRUK :
Melzeme: Nîsk, qelî, pîvaz, dewê keşkê, rişta avê û xwê.
Pêşî nîsk tê kelandin. Pişt re riştê dikin nav. Piştî vê avîdewê keşkandikin nav û di dawiyê de jî pîvazên qelandî bi qeliyê re dikin ser.
Li hinek navçeyan di şûna riştê de hevîrê nû hatî vestirîn jî tê bi kar anîn.

TIRŞIK:
Melzeme: Dan, karî, sêbiske, fasulyên spî, lobiyên hişkkirî, nok, kulindir, huliyên hişkkirî, goştê bihestî, arxafk (rûn û arê di nav hev de sorkirî), zerişk an pestîla huliyan û xwê.
Ji bilî arxafkê, ew melzemeyên jorê hemî bi hev re tên kelandin û di dawiyê de arxafk dikin ser û dibe tirşik.

SERDEW, SERBIDEW :
Melzeme: Savara hûr (zêrik), dewê keşkê, rûn, bîber û xwê.
Pêşiyê savar tê pehtin û heta baş bipije û ava xwe bikêşe tê li hev dan. Pişt re avîdewê keşkandikin ser û di dawiyê de jî rûnê qijilandî yê hinek bîber tê de berdidin ser. Ev xwarina han a zivistanê ye û bi taybetî rojên ku bager be tê çêkirin.

‘PELÎ, ‘pelûk, ‘pelûl, ‘pelûr :
Melzeme: Ar, rûn, xwê.
Ar di rûn de tê sor kirin. Pişt re avê dikinê û rûn jî berdidin ser.
Ev xwarina kesên ku halê wan tenik e.

‘PELIYA KARTOLAN, HEVRÎŞKA KARTOLAN, KARTOLÊ XWEŞKIRÎ :
Melzeme: Kartol, pîvaz, rûn û xwê.
Kartol tê pehtin û pişt re baş tê mizdan. Pîvaz di nav rûn de tê sor kirin û pişt re dikin nav kartolan.

WELÎBAX :
Melzeme: Hevîr (gerek e bi şîr hatibe vestirîn), kartol, penîrê spî û qelî.
Hevîr tê vekirin û melzemeyên jorê dikin navê û bi awayekî gelekî gilover didin hev û bi perçek hevîr devê wê baş asê dikin û dipêjin. Piştî hat pehtin dikin çar perçe û tirşa zuxalê (pestîla huliyan, alûçeyan û hwd) tê pişavtin û dikin ser.

ZULFÎ :
Melzeme: Ar, kakilê gwîzan, bindeq, mewîj.
Ar di nav rûn de tê vestirandin. Pişt re qatek ev arê vestirî û qatek jî kakilê gwîzan, bindeq û mewîj li ser hev tê danîn. Ev li gorî hejmara kesên heyî dikare çend qat bê raxistin.

GOŞTÊ PIZOTÊ :
Melzeme: Goşt û biharat.
Goştê çermekal û yan jî yê ne kêrhatî, wekî zolên pehn baş tê vekirin û goştê baş yê kêrî xwarinê bê dikin navê û dipêçin. Pişt re dikin bin agirê pizot û disekinin heta ew goştê çermekal dişewite. Paşê wî goştê hindurê çermekalan de ye derdixin û dixwin.

XWARINÊN XWEŞKIRÎ :
Li aliyê serhedê li hinek ciyan, eger pincar, kartol, kulindir û tiştên wekî wan, bên pehtin û pişt re bên palandin û baş bên mizdan û hêk bişkînin ser, jê re kartolên xweşkirî, pincara xweşkirî, kulindirên xweşkirî, baqlên xweşkirî û hwd tê gotin.

SINGESÎR : (Singesîr xwarina mîr)
Melzeme: Nanê loş, sîrmast (gerek e mast yê mîyan be), nivişk û xwê.
Nanê loş tê perçe perçe kirin û pişt re sîrmast û nivişkê dikin ser.

BORANIYA KULINDIRAN, kundirmast :
Kulindir, sîrmast û xwê.
Kulindir tê pehtin û baş tê mizdan. Pişt re sîrmastê dikin ser.

ÇIRTMA KULINDIRAN, çirtme :
Melzeme: Kulindir, nîsk, fasulye an lobîyên hişk, rûn.
Kulindir tê sipî kirin û perçe perçe kirin. Pişt re hemî melzeme bi hev re tê pehtin. Xwarineke avî ye.

CAX :
Melzeme: Cax, hêk, rûn.
Cax tê kelandin û piştî ku keliya, eger mirov bixwaze xweşkirî bixwe, mirov ava wê dipalîne û digivêşe heta ku ava tê de xelas dibe û pişt re hêk dişkîne ser û wekî caxê xweşkirî dixwe. Lê eger mirov bixwaze bi avî be û wekî xwarineke avî bixwe, ava wê nayê palandin û bi wî awayî tê xwarin.

ÇILBIRA PÎVAZAN, ŞUWA PÎVAZAN :
Melzeme: Pîvazê hêşîn, rûn, salçe.
Pîvaz di avê de tê pehtin û pişt re rûn û xwêya wê dikin ser û bi nan re tê xwarin.
Şuwa kartolan, şuwa lobiyan, şuwa fasulyan...: Ev jî di şûna pîvazan de kartol, fasulye û lobî tê bi kar anîn.

ŞUWA TIRŞ :
Melzeme: Pincar (spanax, tirşok/evelîk, hêk, rûn, pîvaz, pestîla huliyan, salçe.
Pîvaz û salçe di nav rûn de tên sor kirin. Pişt re tirşok dikin nav. Mirov dikare hêk an goşt jî têke nav. Paşê pestîla huliyan dikin ser û di dawiyê de jî hêk dişkînin navê.

ŞILIK :
Melzeme: Savara hûr, pincar, kartol, nivişk, pîvaz, salçe, domatez.
Ev melzemeyên han hemî bi hev re tên pehtin û pişt re nivişk dikin ser.

XASÎL, xaşîl, kutayî :
Melzeme: Genimê kutayî, goşt, nivişk.
Goşt û genimê kutayî bi hev re tên kelandin. Ev kela han, gerek e heta hebên genim bihele dewam dike. Pişt re dikin tepsiyan û nivişk dikin ser û dixwin.

XUS :
Melzeme: Genimê hêrayî, gûlik (cureyek pincar e) û rûn.
Genimê hêrayî û gûlik bi hev re tên kelandin û pişt re hinek rûn jî dikin nav û ew dibe xus.

ASÎDE :
Melzeme: Ar, rûn, kakilê gwîzan û şerbet (şekir-av).
Ar û rûn di nav hev de tên sor kirin û hinek kakilê gwîzan jî dikin navê. Şerbeta wê tê kelandin. Piştî ku ar û kakilê gwîzan baş hat sor kirin, şerbet dikin ser. Ev xwarina han bi taybetî ji bo jinên ku nû hemla xwe danîne tê çêkirin. Awayê din şêrînahiya piştî xwarinê ye. Li Bedlîsê jê re Şirîn Qeynenax tê gotin.

QEYSERÛN, kincirûn, tirşka mişmişan :
Melzeme: Qeysî, rûn û eger hewce be hinek jî şêrînahî.
Qeysî di nav rûn de tê sor kirin. Eger tirş be hinek şêrînahî dikin nav.

GOZBEZ, gozebez (hingivîn û kakil) :
Melzeme: Dims û kakil.
Ev herdu bi hev re hinekî tên kelandin û pişt re dema ku sar dibe dixwin.

LALEPÊT :
Melzeme: Hêk, mast, rûn, karbonat û şerbet.
Melzemeyên wê hemî bi hev re tên sor kirin û pişt re şerbet dikin ser û wekî şêrînahiya piştî xwarinê tê xwarin.

XURME :
Melzeme: Hêk, ar, mast, rûn, karbonat û kakilê gwîzan.
Hêk û ar di nav rûn de li hev didin û hinek karbonat jî dikin nav û bi vî awayî hevîrê wê hazir dikin. Ev hevîr wekî perçên biçûk biçûk tê vekirin. Pişt re kakil dikin navê û li ser bijîngê dipêçin. Pişt re di nav rûn de sor dikin. Eger mirov ji bo taştê bi kar bîne şerbet nakin ser, lê eger mirov wekî şêrînahiya piştî xwarinê bi kar bîne, şerbet dikin ser.

ŞORBEŞÎR, gireşîr, sûtlaç :
Melzeme: Birinc, şîr, şekir, darçînê hêrandî.
Birinc û şîr û şekir bi hev re tên kelandin. Ev kela han heta av tê de nemîne dewam dike. Pişt re dikin tasikan û darçîna hêrandî li ser direşînin.

MEHELEBÎ :
Melzeme: Arê birincê, şîr û şekir, darçînê hêrandî.
Şekir dikin nav şîr û dikelînin. Pişt re arê birincan dikin nav şîr û baş li hev dixin da ku tîr dibe. Paşê jî hemî dikin nav hev û dikelînin heta ku tîr dibe. Pişt re jî dikin tasikan û darçîna hêrandî li ser direşînin.

XWERÎS, MIRTOXE :
Melzeme: Ar, rûn.
Ar di nav rûn de baş tê qumandin û serê siban bi hingivîn an reçelê re tê xwarin. Eger şêrînahî bikin nav vê xwerîsê, jê re xwerîsa şêrîn tê gotin.

ARXAFK, kincirûn, arxafka bi kincir :
Melzeme: Ar, hêk, rûn.
Rûn tê helandin û pişt re ar didin ber û li hev didin heta ar baş diqome. Pişt re jî hêk dişkînin ser û li hev didin heta hêkên wê bipijin. Serê siban bi hingivîn an rêçelê re tê xwarin.

KADÊ GWÎZAN :
Melzeme: Hevîrê bi şîr û rûn hatî vestirîn, kakilê gwîzan ê hêrayî yan kutayî.
Qatek hevîr û qatek kakilê gwîzan li ser hev tê raxistin. Li gor kesên heyî ev qatên han dikarin hindik an zêde bibin. Pişt re dikin tenûrê û dipêjin.

KADÊ TEWÊ :
Melzeme: Hevîr, xwerîs, rûn.
Hevîr vedikin û pişt re xwerîs dikin navê û didin hev. Pişt re rûn dikin tewê û ew hevîrê xwerîs tê de dikin nav wî rûnî û heta baş sor dibe sor dikin.

NANÊ TEWÊ, biçirk, zengil, zîlopî :
Melzeme: Hevîr û rûn.
Hevîr qasî mezintiya tewê tê vekirin û pişt re dikin nav rûn û heta ku sor dibe tê pehtin.

Dom dike

Devoka Qerejdaxê

- X -

Amadekar : Mehmûd LEWENDÎ

kurdî	tirkî	fransizî	ingilîzî
şewate, agir, agirberbûn	yangın	incendie	fire, arson
şêlandin : şelandin, tazî kirin, rûs kirin	soymak, soygun yapmak	dépouiller, voler	to rob
şêlpîs, şêlgenî, şêlxerab : nelêkdayî, bêserûber	evinin görünümü kötü olan, evini kötü çekip çeviren kadın	mauvaise ménagère	bad housewife
şênî	ahali	population, habitants	population, inhabitants
şêz	at sineği	mouche-araignée de cheval	forest fly
şikev: şikêv	tekne, içinde kuru çökelek eritilen tahta tekne	pétrin (en bois)	wooden dough trough
şikeva, (nanê şikeva) : şikevale	mayasız ekmek	pain azyme	unleaven bread
şikeva belav kirin	1) ölülerın ruhu için yada kötü bir rüyadan sonra dağıtılan sadaka ekmeği; 2) erkekçe dağıtmak, onlarla cömertçe yatmak (kadın içe)	1) distribuer du pain pour la paix des morts; 2) être généreuse avec les hommes, coucher avec plusieurs hommes	1) to give away bread to the needy for the peace of dead; 2) to be generous with men, to sleep with many men
şilî	yağış, ıslaklık, yağmur	pluie, précipitation, humidité	rain, dampness
şilope : şilove	sulu kar, sulu sepken	giboulée	sleet
şilp : şirp, şilq, çirp, pir	aniden, zıp	soudain, tout d'un coup	suddenly
şil û pil : ter û şil, av û zêlak	yamyaş, ıpıslak	tout mouillé, trempé	all wet, soaking
şima : şema	balmumu	cire	wax, beeswax
şirt : gêzik, melkês, cerîfk, bermalk	süpürge	balai	broom
şirt kirin : gezî kirin, malîn, maliştin	süpürmek	balayer	to sweep
şîrgermî : têhnşîrî, şîrogermî, şîregermî	ılık	tiède	tepid, lukewarm
şorik : girêz, gilêz, gilîz, gilîze	salya	salive	saliva
şortik : şotik, deşo	çok su katılmış olan ayran	petit-lait très dilué	very dilute fermented milk
şoşman : şoşmîn, brazava	sağdıç	ami intime du marié qui le conseille pour la nuit nuptiale	bridegroom's best man who advises him for the nuptial night
şûş bûn : şoş bûn, şîş bûn	1) kayarak düşmek; 2) kandırılmak, yoldan çıkarılmak, enayi yerine koyulmak	1) tomber en glissant, s'étaler; 2) se faire avoir	1) to slip, fall headlong; 2) to be caught, to be cheated

şûş kirin	1) kaydırarak düşürmek, 2) kandırmak, yoldan çıkarmak	1) faire tomber quelqu'un; 2) arnaquer, berner qn.	1) make s.o. fall; 2) swindle s.o.
talîzok, babîsok, babelîsk, bablîsok	hortum	tourbillon	whirlwind
tahm dan (ta'mdan), dehf dan, pal dan	itmek	pousser	to push
tar, kevî, kevan : tara bêjingê (moxilê)	kasnak	cadre (d'un tamis, tambour)	frame, hoop (of a drum or seive)
tavilê, tafilê, tafilkê	hemen, derhal	aussitôt, immédiatement	straight away, immediately
tem	arzu, istek	convoitise, désir	coveting, desire
tem kirin	arzu etmek, tama etmek, amahlanma	convoiter, désirer	to covet, to desire
tem : di tem û tayê de bû	kemalinde, güçlü dönemi	au faîte de la puissance	at his (her) heyday
temisandin : demisandin	bastırmak	tasser, entasser	pile up, be crushed together
temisîn	bastırılmak	se tasser, s'entasser, être entassé	to be crowded
tengijandin : tingijandin	öfkelendirmek	mettre en colère	to anger, to infuriate
tengijîn	öfkelenmek	se mettre en colère	to grow angry
tepik, tarik	duvara yapıştırılıp kurumaya bırakılan yaş tezek	galette de bouse de vache	dried dung
teqa	kör pencere	fenêtre aveugle	blind window
teral, tiral	tembel	oisif, fainéant, paresseux	lazy, good-for-nothing
terişandin : tehisandin	kaydırıp düşürmek	faire glisser et tomber	to make s.th. fall or slide
terişîn : tehisîn	kayarak düşmek	glisser et tomber	to slide or fall
tertere, tewtewe, felîte	aylak	oisif, désoeuvré	idle
terxê	obur (kadın)	femme glouton, goinfre, vorace	greedy or gluttonous woman
terxo	obur (erkek)	homme glouton, goinfre	greedy or gluttonous man
tetirxanî bûn	aşırı yemek yemekten dolayı midesi bozulmak	avoir des coliques à force de manger	to have a belly-ache from over-eating
tetirxani kirin	aşırı yemek yemekten dolayı midesini bozmak, birine aşırı yedirip midesini bozmak	gaver qqn et provoquer en lui des coliques	to over-feed s.o., to give him a belly-ache
têwerdan	kabı çalkalamak, durulamak	rincer	to rinse out on thoroughly
tirone, tirole	züppe	snob, dandy	affected person, snob
tirsonek : tirsek, newêrek, tirstirsok	korkak	couard, lâche, poltron	coward, poltroon
tivanc girtin	dersini alma, ağzı yanma	prendre une leçon; avoir une expérience douloureuse	to earn a lesson, to have a painful experience
min tivanca xwe girt	dersimi aldım, ağzım yandı, bu bana ders olsun	j'ai appris ma leçon	I have learnt my lesson
tîr, brûsk	sancı, ani yoğun acı	douleur soudaine et vive (comme une flèche)	sudden, sharp pain (like an armour)
tîrmar : tîremar, marê teyar, marê siwaran	ok yılanı	serpent d'eau	water snake
tog	erkek köpekle dişi tazıdan olan melez hayvan	chien né du croisement d'un chien et d'une levrette	a dog crossbed with a grey hound
toş : tûş, bîst	an, lahza	moment, instant	moment, instant
toş : felaket, musîbet	felaket, musibet	calamité, désastre	calamity, disaster
toş : çors	birkaç kişiyle oynanan bir çeşit taş oyunu	un jeu de dames	a kind of checkers game
tot bûn	yuvarlanmak, itilmek	se rouler, se déplacer en se retournant	to roll, to move by rolling
tot kirin	yuvarlamak, itmek	rouler, déplacer, pousser	to roll
tozan : bakuzîrk, tozana berfê	toz toprak karışımı esen rüzgar	vent fort qui déplace de la poussière ou de la neige	a strong wind, a dust or snowstorm
tûmarî, tumî, tumarî, temamî; sax	yekpare, bütün olarak, tomar	totalité, d'une seule pièce, en totalité	complete, all of one piece
vaca, vajî	tersine çevrilmiş olan	envers, à l'envers	back to front, inside out
vaca bûn	ters döndürülmek, tersine çevrilmek	être à l'envers	to be back to front
vaca kirin	ters döndürmek, tersine çevirmek, içini dışına çıkarmak	mettre à l'envers	to reverse, to put back to front
vebirîn	birbirinden ayırmak, bölmek, gürültü veya sesi kesmek	couper, diviser	to cut, to divide
veçinîn	ot, çimen gibi şeyleri yerden koparmak, yolmak	extirper, déraciner	to uproot, to eradicate
hilçinîn	ayıklamak	trier	to sort
vekolan	kazmak	creuser, excaver	to dig, to excavate

Îdyomên kurdî

Amadekar : Hemîd KILIÇASLAN
Mustafa AYDOGAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
gurrî mir bû gulîsor ; mirî dimre qûnzêrîn dibe, qûna mirî bi hingivîn e	kel adam öldü bol kızıl saçlı oldu (ölümünden sonra aşırı methedilen kişiler için denir)	une fois mort le chauve est paré d'une (belle) chevelure rousse (se dit lorsqu'on exagère la louange d'un défunt)	the bald man became a redhead (said of excessive praising of one deceased)
hatin agirekî > ma tu hatiyî agirekî ?	acelen ne ? niye fazla kalmıyorsun ? (bir yerde kısa süre kalan ziyaretçiye denir)	(litt.) se dit à un hôte ou visiteur pressé, qui ne reste pas longtemps	(litt.) what is your hurry ?
hatin meşkekê > ma tu hatiyî meşkekê; dibê qey tu bavê bûkê yî ?	kendini olduğundan daha büyük göstermeye çalışma (özellikle kadınlar arasında)	se donner une importance exagérée (comme le père de la mariée)	to exagerate one's importance (like the bride's father)
hay ji bayê felekê nebûn	dünyadan, olaylardan bihaber olmak	(litt.) ne pas être au courant du vent de la fortune ; ignorer les événements	to be out of touch with current events
hec bi wesiyeta nabe	vasiyetle hac ifa edilmez ; her iş ısmarlamayla olmaz	on ne peut pas devenir pèlerin par procuration, il y a des choses qu'on ne peut faire que soi-même	you cannot become a pilgrim by proxy (there are some things one has to do oneself)
heçiyê wî qelişiye	adı kötüye çıkmış, ne dese ne yapsa kötüye yorumlanır	(litt.) son crocher est brisé, comme il a une mauvaise réputation, quoi qu'il fasse ce sera mal interprété	(litt.) his hook is cracked ; i.e. he has such a bad reputation, that whatever he does will be seen in a bad light
heft hespên wî ji keran avis in	yedi atı eşeklerden gebeymiş gibi (yani yedi katır sahibi zengin biri gibi böbürlenen)	(litt). ses sept juments sont engrossées par un âne ; il est hautain comme un homme qui va posséder sept mules et devenir ainsi riche	his seven mares have been impregnated by donkeys ; i.e. he is as haughty as s.o. who will become rich by having seven mules
hela bê çend ser bi ceftê tê	değersiz bir şey karşılığında büyük gelir beklemek	attendre un gros gain en contrepartie de quelque chose de sans valeur comme des écorces de glands de chêne	to expect big returns (to earn a lot of money) from a thing of little value (tanning powder)
hela yekî bi dê û bav bike	hele bir işi doğru dürüst bitir sonra başka işe giriş	se dit à qqn. qui entreprend plusieurs choses sans les mener à bien ; (litt.) élève donc un enfant avec père et mère jusqu'à son terme (avant d'en faire un autre) : termine une chose avant d'en entreprendre d'autres	said of s.o. who undertakes several projects without finishing any of them

herdu lingên (nigên) me xistin soleke teng	iki ayağımızı bir papuca soktular	vous nous avez mis dans une situation très difficile ; (litt. vous avez mis nos deux pieds dans la même chaussure)	you've put us in an uncomfortable situation (i.e. you're forcing both of our feet into one narrow shoe)
hesp siwarê xwe nas dike	at sahibini (binicisini) tanır, binicisine göre iyi ya da kötü koşar ; bir işi ehli olan iyi yapabilir	(litt.) le cheval connaît son cavalier ; il court plus ou bien selon la qualité de son cavalier : il faut être compétent, connaître son affaire	the horse knows its riders : one should be competent, one should know one's business well
hesin bi sarî badide (xwar dike, ditewîne, dicû)	başarlmaz zor işleri yapacak iddia ve güçtedir, güçlüdür, zorludur	il tord le fer à froid (il est à même de réaliser un tour de force, des choses difficiles)	(he's so strong that) he can bend cold iron
hespê min lê nabeze	gözüm onu kesmiyor, sözüm ona geşmiyor	(litt.) mon cheval ne court pas devant lui ; je n'ai pas d'influence sur lui, je ne peux pas lui demander qch.	I have no influence over him (litt. my horse won't gallop for him)
hestî ji hev şikênandin	birbirini fazla incitmek	se faire beaucoup de mal l'un à l'autre (litt.) avoir des os brisés	to break one another's bones (fig.), to injure oneself
hevalê kodbiqul, destê wî nagihê devê wî	iki yakayı bir araya getirememek	(litt.) avoir le bol troué comme le tonneau des Danaïdes ; tirer le diable par la queue malgré tous ses efforts	no matter how hard he works, he cannot make ends meet
hevaltiya quling û rovî ye	turna ile tilki dostluğu gibi aldatıcı dostluk	(litt.) amitié de la grue et du renard ; amitié basée sur la tromperie, amitié incompatible	friendship based on mutual deception, incompatible friendship
heyvanê (havênê) heft satil(ên) şîr e	çaktırmıyor ama çok bilen ya da etkin biri (yedi bakraç sütü mayalayacak güçtedir)	(litt.) c'est la levure de sept seaux de lait; il ne le montre pas mais il connaît plein de choses ; il est très efficace	he may not show it, but he's very efficient, or skilled
hilî çand, virnî ket	umduğunu bulamadı	les résultats ne correspondent pas à ses attentes ; il est déçu par les résultats de son entreprise	the results are not up to expectations, he is disapointed
hûrê wî daketiye : pirr birçî bûye	midesi sarkmış : çok acıkmış	sa panse pend : il a très faim	he is very hungry
hûr pê de teqandin	berbat etmek, içine etmek	gâcher, ficher en l'air (litt.) faire éclater la panse	to spoil everything
îş têl e	işler yolunda	les affaires vont bien	business is going well
ilmê tûrikê	yüzeysel, aldatıcı bilim ; sahte ilim	fausse science ; science superficielle et trompeuse des gens dont tout le bagage est contenu dans une sacoche	phoney knowledge, superficial
inabê wê ketine ; alûmên wê hilû bûne	aşırı yaşlanmış ; işi bitmiş	elle/il est hors d'âge, hors d'usage	out of use, worn out
jê keto pê keto	besle kargayı oysun gözünü	se dit aux gens qui se retournent contre leurs parents, leurs bienfaiteurs ; (litt.) il en est descendu et s'en est pris à lui	said of people who have turned against their parents or benefactors
ji kîsê kirim xweş dibirim	bol keseden atmak, vaad etmek	promettre sans compter, sans l'intention de tenir sa parole	to promise without counting, with no intention of doing it
ji aliyê qûnê ve lê nêrîn	sorumluluktan kaçınmak, yeterince dikkat etmemek	(litt.) regarder par son derrière : ne pas prêter attention ; ne pas s'impliquer	not paying attention, not getting involved
ji dara ketin	çok şaşırmak, hayal kırıklığına uğramak	chercher querelle, chercher noise	picking a quarrel
ji dest(an) kirin	direkt, aracısız satın almak	acheter directement au propriétaire (ou producteur) ; acheter sans intermédiaire	to buy directly from the owner
ji destê duduyan	ikinci elden, kullanılmış	usagé, de seconde main	used, second hand
ji devê (hêştirê) dikeve ji hopehopê namîne (nayê xwar)	deveden düştü ama fiyakasından / havasından eksik kalmıyor / yüksek statüsünü kaybetmesine rağmen eskisi gibi davrananlara söylenir	il est tombé du haut du chameau mais ne manque toujours pas d'air	he fell from the camel but does not lack air
ji mêzîn de ketin ; ji kêşê ketin	dengesini kaybetmek	perdre la boussole	to lose one's bearings
ji pirsan peyivîn, ji ber xwe ve axivîn, ji pesnan xeberdan, ji bestê xeberdan	1) sayıklamak, hezeyan getirmek ; 2) münasebetsiz konuşmak, mevzu dışı konuşmak	1) délirer ; 2) parler hors propos	1) to be delirious; 2) to talk off the subject
ji qûntengiyê, ji qûştengiyê kirin	çaresizlikten reva olmayan bir şey yapmak	faire quelque chose d'impropre, contraint et forcé, faute de moyens	to do, or be obliged to do the wrong thing through lack of means
ji ser şûrê tazî venagere	her belaya bulaşıyor	il se mêle de toutes les querelles (litt.) il ne rengaine pas son épée	he will not sheathe his sword i.e. gets involved in all quarrels
ji serê xwe têr e; têra xwe heye; têra xwe dike	işini bilir	il sait se débrouiller, il peut se défendre	he knows how to manage, to get by
kaya şil firotiye	yaş saman satmış, kötü iş yaptığının bilincindedir	(litt.) il a vendu de la paille mouillée, il a fait une mauvaise chose et il en conscient	he sold damp straw, i.e. did wrong and knows it
kavilên (kavirên) wî bela ne	işleri dağınıktır, kafası dağınıktır (keçileri kaçırmış)	il a des chèvres éparpillées, il a l'esprit confus, désordonné	his hair is on end; i.e. is confused
keçika sêv di paxilê de ye ; morîka şîn e	mavi boncuk kimdeyse, gönlüm ondadır	(litt.) celui qui a la pomme (ou la perle perle bleue) a mon coeur ; se dit pour quelqu'un qui fait la même promesse à beaucoup de monde	said of some one who promises the same thing to many people
kenê te li te here gilî, kenê li te bibe girî	gülmen acıya (ağlamaya) dönüşecek	(litt.) ton rire deviendra pleurs	your laugh will turn to tears
kêr gehişt hestî	bıçak kemiğe dayandı	(litt.) le couteau a touché l'os ; il a atteint les limites du supportable	the knife has reached the bone, he has gone beyond his limits
kêr li werselê rast hat	tam isabet etti ; darbesini iyi yerleştirdi	il a touché le mille ; il a fait mouche	he hit the target, he scored
kêra du dev e	her yönden zararlıdır	c'est un couteau à double tranchant	it cuts both ways
kera bavê kê kulek e ?	kimin kimdin neyi eksik ki ?	en quoi suis-je en reste ? (litt.) l'âne du père de qui est-il boiteux ?	how do I owe something?
hin peyvên kêmnas	**bazı az bilinen sözcükler**	**certains mots peu connus**	**some uncommon words**
heçî, heçik	ağaçtan çengel	crochet en bois	wooden hook
neam	deve kuşu	autruche	ostrich
ceft	palamut kabuğu, dabbaklıkta kulanılır	écorce de gland de chêne broyée utilisée dans la tannerie	acona shell, ground into a powder used in tanning leather

Hin cureyên endamên laş û îdyomên jêçêkirî

Amadekar : Reşo ZÎLAN

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
CEGER, cerg, kezeb	**CİGER**	**FOIE**	**LIVER**
kezebreşî, (kulecergî) kirin	(birini) verem etmek, kahr etmek	rendre qqn malade, excéder qqn	to disgust s.o., make s.o. sick
kezebreşî, (kulecergî) bûn	kahırdan verem olmak, hasta olmak	être excédé, devenir malade à cause de l'inconduite de qqn	to be disgusted, be sick (and tired)
cegerpola, cergpola	çok cesur, korkusuz, yiğit	preux, sans peur	fearless, brave, with nerves of steel
cegerperitî, kezeperitî	ciğeri pare pare olmuş, çok acı çekmiş	très affligé (litt. qui a le foie en lambeaux), très peiné (bouleversé)	extremely upset, extremely distressed
bêceger	korkak, ürkek, ciğersiz	peureux, poltron	cowardly
cegerhîz, cegerhilûk	yakınlarına aşırı düşkün	qui est très attaché à ses proches, sentimental	extremely attached to or doting on, one's children
cegersoj (cergsoz), cegerşewat, kezebşewat	yanık, duygulandıran	qui brûle les entrailles, très touchant	very moving, emotional
MIL, pî	**KOL**	**EPAULE**	**SHOULDER**
milpan, pîpan	geniş omuzlu	qui a des épaules larges	broad-shouldered
NEYNÛK	**TIRNAK**	**ONGLE**	**NAIL**
neynûksor	kırmızı tırnaklı, ojeli, mec. makyajlı şehir kadını	(litt.) qui a des ongles vernis; femme maquillée, urbaine	a woman whose make-up or nailpolish are overdone, city woman
neynûkpan	geniş tırnaklı	qui a des ongles larges	(s.o.) with long fingernails
LÊV	**DUDAK**	**LEVRE**	**LIP**
lêvsor	kırmızı dudaklı, dudaklarına ruj sürmüş, modern kadın	aux lèvres rouges; femme moderne, urbaine	with (red) lipstick, i.e., a modern woman
lêvdeqandî	dudakları tatulu; arap kadını	aux lèvres tatouées; fig. femme arabe	with tattooed lips, fig. Arab woman (bedouin)
PIŞT	**BEL**	**DOS**	**BACK**
piştzirav, newqzirav, navzirav, navtengzirav	ince belli	qui a la taille fine	svelte, thin-waisted
piştxûz, piştxûl, piştxwîl, piştxwar, piştçemyayî	eğik sırtlı	qui a le dos voûté	with bent back (decrepit)
piştmilk, piştqop, piştko, piştqov, piştkov(ik), piştkod, piştkubik, piştbimil(ik)	kambur sırt	bossu	hunchbacked, humpbacked
piştpan, milpan, qorikpan	sırtı geniş	qui a le dos large	with a broad back, broad-backed
piştrast : piştqayîm, ewle	emin	sûr, fiable	sure, confident; reliable, dependable
piştmêr, paşmêr	arka, çıkan, destekleyen, kollayan adam	homme de soutien, défenseur, partisan, garde	bodyguard, henchman,
pişt	sırtı güçlü olma; döl	soutien, arrières	support, backing
bêpişt	sırtı, desteği olmayan	qui n'a pas d'arrières, sans soutien	defenseless, lacking support or backing
piştber, paşber	son doğan çocuk (çoğu yerde erkek çocuk)	dernier-né	last born
ji pişta yekî bûn	birinin dölünden, zürriyetinden olmak	être de la descendance de qqn.	be descended from s.o.
piştgermî : pêbawerî	güven, itimad	confiance	confidence
piştgirî, piştevanî	destekleme	soutien, support	support
piştkulî	güvenirsizlik, gocunma	manque de confiance, suspicion à cause de mauvaise conscience	suspicion because bad conscience, lack of trust, confidence
piştedar, piştîdar	hamal	porte-faix, porteur	porter
piştî	sırtla taşınan yük	faix, fardeau, charge portée sur le dos	burden, load, bundle

Termên kompûterê

Amadekar : Behroz ŞUCAÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
derok	priz	prise	port
derokên rêzeyî	seri prizler	prises en série	serial ports
derokên paralel	paralel prizler	prises parallèles	parallel ports
tûş	tuş	touche	key
klaviye	klavye	clavier	keyboard
prosesor	prosesor	processeur	processor
ekran	ekran	écran	screen
monîtor	monitor	moniteur	monitor
peydaker	araştırma motoru	moteur de recherche	search engine
lêgerk		navigateur	browser

KURMANCÎ
MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE
© INSTITUT KURDE DE PARIS
106, rue La Fayette, 75010 Paris - France
www.institutkurde.org
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN
Réalisation : S. ILITCH & M. HASSAN